Sînor



Kerkûk di çavê Hecî de

Luqman Asîhî

Welê hatibû, êdî Hecî nedikarî nivêjên xwe jî li mala Xwedê bike, ew zû ji malê dernediket. Neviyê wî digot: Gava dengê firokan dihê pên wî xwe li çi cihan nakirin û dunya lê dibe qapûşka kezwanê, qet ji pêşmergeyan hez nedikir û ew şevên ku hindek tîpên wan dihatin gundî û şîva xwe li wê derê dixwarin, wî qeseyên çewt û nifrînên Fîrewnan li wan dikirin. Roj derbaz dibûn û jimareya pêşmergeyan pitir dibû ta weha lê hat, êdê bi rojê jî di nava kolan û malên gundî de dihatin dîtin. Şevekê; çaxê pêşmergeyekê hindekê ji gundiyan re qala şorişê û şehîdan dikir, Hecî rabû ser lingan û bi serkolî pêşmergeyan re axivt: Niho we û Mela Mistefayî çi bihîstiye, ku hûn ji sere van çiyan danakevin xwarê?!

Serkolî bersiva Hecî bi girnijîn ve da, got: Em wê gaza Kerkûkê ji nav destên dijminan derxin. Hecî lê vegeran: Lawê bapîrê xwe, ma me çi bi gaza Kerkûkê gereke? Ne li vî gundî hemû salan beriya zivistanê dakeve û befr bibare, here malek tenekeyek gaz ji xwe re digire, têra bi ronî kirina çirakê şevên wî dike, vêca Kerkûk hûn û Mele Mistefa dev ji vî şerî berdin. Ez êdî nema dikarim di mala xwe de jî ji ber dengê firokeyan di xew biçim. Wê salê çîroka Heciyê kal kete ser zimanê hemû pêşmergeyan û ji dil pê dikenîn, lê ji wê rojê û ta niho, şoriş hîn berdewam e û Kerkûk jî hîn Kerkûka wî zemanê Hecî ye, îro piştî borîna 40 salan li ser tirs û kujtinên wî, ez jî niho weku Hecî ditirsim ku sibe ji dengê firokeyan li mala Xwedê nivêjan nekim. Îro gerek tiştên din bihên kirin. Çi ye tinê siyesetvan pê dikarin…!